



Eli M. Gold

“Eva destpêka qonaxeke nû ye di siyaseta Îranê de”

»»» R:3



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (329)06-07-2018 Buha (1000) Tûmen



Şerîf Hejarî: Nirxandin û hevberkirina Dr. Qasimlo û rêberên din ên Kurd digel hevdu, nîşana naser-wextî û nehişyariya civaka Kurdistanê ye

»»» R:4

Rasan ber bi kopikê ve

»»» R:2



Pêşmerge çavkaniya vîna gel e



@PDKImedia
YouTube f TISHKTV



Di heyama derbazbûyî de, Hêza Pêşmerge Kurdistanê, çendîn çalakîyên berfireh û balkêş di navçeyên cuda-cuda ên Kurdistanê de bi rê ve birin, ku di vir de bi kurtî têne rûmalkirin:

Di doma kar û çalakîyên “Hêza Pêşmerge Kurdistanê” di nav komên xelkê de, “Hêza Pêşmerge Kurdistanê” civîneke berfireh ji bo xelkê “Sîngan” ya girêdayî bajarê Şinoyê lidar xistin. Li gorî raporta Ferman-

dariya “Hêza Pêşmerge Kurdistanê”, demjmêr 7:30 êvarîya roja Înê, rêkevtî 8`ê Pûşpera 1397`an, “Hêza Pêşmerge Kurdistanê”, çûne nav gundê “Sîngan” a girêdayî bajarê Şinoyê, û digel xelkê vê gundî civiyane.

Femandariya “Hêza Pêşmerge Kurdistanê” êşkere jî kiriye ku, pêşmerge PDKÎ li gundê “Sîngan”ê digel pêşwaziya bêhempa ya xelkê vî gundî rûbirû bûne, û ji bo çend dem-

jmêran di nav gund û cem xelkê “Sînganê” mane. Li gorî vê raporê, pêşmerge PDKÎ ji bo heyameke zêde cem xelkê gundê “Sînganê” çalakî encam dane, û ji bo xelkê civîn pêk anîne, û xelkê vî gundê jî pêşwaziyeke bê mînak ji pêşmergan kirine. Piştî lidarxistina civînê, û çalakîyên din yên “Hêza Pêşmerge Kurdistanê”, pêşmerge PDKÎ bi silametî cihê civîna xwe terk kirine, û ji bo bicihanîna erk û wezîfeya ku hizbê ji wan re diyarî kiriye,

meşiyane.

Femandariya “Hêza Pêşmerge Kurdistanê” piştî ragehand ku: Li gorî van zanyariyên ku niha gihîştine destê “Femandariya Hêza Pêşmerge Kurdistanê”, gundê “Hesenuran” ji aliyê Spaha Pasdaranê ve hatiye dorpêçkirin, û hêzeke zêde ya rejîmê jî, ji bo deverên din yên Kurdistanê şandine, û gundên weke “Xanler”, “Sevce”, û “Gundewêlê” hatine dorpêçkirin, û ev gundane

li ser riya di navbera bajarên “Şino” bo “Nexede” hilketine. Di doma vê daxuyaniyê de hatiye: Spaha Pasdaran ya rejîmê bi armanca pêşgiritin ji hatin û çûna xelkê, û herwiha “Hêza Pêşmerge Kurdistanê”, di navbera gundên “Xanler” û “Gundewêlê” de, xalên lêgerînê danîne, û beşeke zêde ji endamên “Gurdana Hezretê Resûl” ku, gurdaneke zerbetî ye, ji aliyê rejîmê ve, li Qendîlê bo deşta “Lacanê” hatine

»»» R:2

Sergotar**Rasan ber bi kopikê ve****N: Kerîm Perwîzî**

Rasana Rojhilata Kurdistanê bixwedecûn û dakutana tep û toza derbasbûyeke nîzik û rabûna ser piyan ya neteweyekê bû ku dujminê stemkar û darûdestên wê wusa dizanîn ku ew biçokde anîne, lê nedizanîn ku neteweya Kurd tenê derfet bi xwe daye heya ku beşek din ji nîştîman ewle û pê bigre, û li rewşa nû de jî wusa nîrxandîye ku dujmin hemû derfet ji dest dane, û hewce dike ku ev agirgeha pirrgurîtir jî bibe.

Tendûra xebata Rojhilata Kurdistanê germ û gurrîr hat kirin û ji kopika çiya ve, rêberên çiyabawer, peyama xwe gehandin guhên neteweyekê. Peyama rabûn, rasan û jîna serbilindane û serkevtin di çîrançepên xebatê.

Hebûn kesên ku dudil bûn ji peyamê, herweha hebûn ku rêvîngên xebatê jî dilsar dikirin, lê li hember de zêde bûn yên ku amadeyî cangorîtiyê bo coşdana xebatê bûn.

Her çiqas ku piştî sê salan, nîrxên mezin ji bo vê rabûnê, û rabûna ser pê ya neteweyê hat dayîn, lê tev bangên bêhêvîtiyê hatin pûç û mandelkirin, û dengê Rasana Rojhilat zelal û dilê e, û digihîje guhên hemû dunyayê, û bargeha desthilatdarên Amerîkayê jî. Sîma û cewhera Rasanê jî rohn û biheybettir e, dema ku em dibînin pêşmergeyê cangorîyê nîştîman li nav ezîztirîn kesên xwe de, anku xelkê pêşmergeperwer ên Kurdistanê bi hambêzek vekirî tîr pêşwazî û guhdarîkirin, û di nav dilê xwe de diparêzin. Rasana Rojhilata Kurdistanê pêk nayê ji teqekirin û nîşandana çekan, her çiqas ku li hember dujminêkê wekî Komara Îslamî de hewcehiya çekê bona xweparastinê heye, lê Rasan pêk hatiye û tê ji hêma û nîşana hêzbexşe pêşmerge û dilê vekirî yê bajar bona beşdarîkirin di xebatê de.

»»»» Doma manşetê

veguhastine.

Fermandehiya Hêza Pêşmerge Kurdistanê di nûçeyêke din de belav kir, ku roja Duşemiyê 11'ê Pûşperê demjimêr 9'ê şevê hêzên rejîma Îranê ji tîrsê Hêza Pêşmerge li pişt gundê Quruşawê a ser bi Şinoyê ketine boşeya hevdu, û hev dane ber gulleyan. Li gora vê nûçeya Fermandehiya Hêza Pêşmerge Kurdistanê, di encama teqeya hêzên rejîmê li hevdu, hejmarek ji hêzên rejîmê hatin kuştin, yan jî birîndar bûn, û rejîmê ambolans şandin cihê pevçûnê.

Herwisa Çarşemiyê demjimêr 10'ê şevê, 13'ê Pûşpera 1397'an a Rojî (4'ê Tîrmeha 2018'an a Zayînî), Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê li gundê "Nê" a bajarê Merîwanê li meydana Dr. Qasim-lo di derbarê Rasan û xebata nû a partiya me de civîneke berfireh pêk anîn, û xelkê "Nê" a hertim Demokrat jî bi germî pêwazî ji wan û civînê kirin.

Li gor zanyariyên Fermandariya

Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê, jin, zarok, ciwan, pîr û kalên xelkê gundê "Nê", pêşmerge hem-bêz kirin, û bi rondik û hesirên ji xweşiyê, pêşwaziya wan kirin. Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê di civînê de ji wan kesan ku alîkariya Spaha Pasdaran û saziyên sîxurî ên rejîma Komara Îslamî a Îranê dikin, xwast ku vegehin hambêza gel, û pişt a xwe bi xelkê xwe germ bikin.

Di dawiyê de jî, Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê digel çepikên xelkê, ji bo berdehamkirina çalakîyên xwe ji wir derketin. Pêdagirîya neteweya Kurd li ser daxwaziyên neteweyî û xebata bibawera ya pêşmergeyên PDKÎ di pêxema bidestxistina armacên neteweyî, bûye sedema vê ku Kurdistan ji aliyê rejîmê ve bi awayekî ecêb bihê militarîzekirin, û hêzeke zêde ya dijmin di Kurdistanê de bihê moldan, ku armanca sereke ya wê, fetisandîana dengê mafxwaziya xelkê Kurdistanê û nehêlana çalakîya pêşmergeyan bûye.

Vejiyana xebata PDKÎ di çarçoveya Rasanê de bûye sedema

têkçûna wê xewn û xeyala ku rejîmê bo welatê Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî pîlan jê re darêtibû. Rasan û xebata nû ya PDKÎ û çalakîya berdeham ya pêşmerge di navxwe ya welat de dijmin be'ecandîye û perîşe kiriye.

Lewra rejîm wekî hertim dixwaze ku Kurdistanê zêdetir militarîze bike, heya ku bikare pêşiya xebata çiya û bajar ya civatên xelkê Kurdistanê û pêşmerge bigre. Di doma militarîzekirina Kurdistanê de, rejîmê dest kiriye bi vakirina hinek binkeyên nû yên leşkerî di navxwe û bi taybetî li ser sînorên Başûr û rojhilata Kurdistanê, û bicihkirina çekên giran wekî tank, neferhilgir, top, katiyoşa, Mînî katiyoşa û komeke çekên din.

Di van çend rojan de rejîm ji tîrsa çalakîya pêşmergeyên hizbê, hêzeke zaf û alavên zêde ên leşkerî anîne ser sînor, û gundên Urmiye, Şino, Pîranşar, Merîwan, Seqiz, û Jawero û bi gullreşandin û topbarankirinê, jiyan li xelkê xwedî zewî û zar û zozaniyan tal kirine.



Niha em dibînin ku îradeya han hêdî-hêdî û li ser xwe, lê bi bihêzî û qahîmî xwe diselimîne.

Li destpêka demsala nû ya xebatê de, riya xebatê hinekê bi evraz û asê û nediyar derdiket û tenê yên ku îradeya serê çiya jî newî dike, xatircem bûn ji serkevtin û rastiya riyê, levra jî me dît ku li Qereşeqel û Kosalanê de hemase û destanrêş afirandin, heya ku baweriya bilind ya gihîştin bi kopikê bi neteweya Kurd bibexşînin. Ew hemase, xwîn, cangorîti û baweriya bilind û îradeya hesinîn bû ku îro ji me re afirandin, û em dibînin ku Rasan bi bihêzî ber bi kopikê ve hildikişe, herweha ev fedakarî û cangorîtiyên îro ne ku sibeyî û pêşeroja avedaniya nîştîmanekê ji me re bi diyarî tînin. Rasan li dijî tarîtiyê berdeham e.

“Eva destpêka qonaxeke nû ye di siyaseta Îranê de”



Eli M. Gold
Washington Times

Beşa şikarî- Boçûn

Bûyerên Desambara 2017'an xalên guherînê bûn, di dîroka nû ya Îranê de. Meşên van dawiyane ku digel nerazîbûnên 2009'an ya reformxwazan (naskirî bi çîna navgîn û xwendewar a Tehranê) nahê hevberkirin, û gellek cuda bûn, jiber ku meşên bi tewahî sekolar û civakî, li dijî rejîma Tehranê (ji serî heya binî) bûn, û mezhebî nebûn, berevajiyê van meşên din, vê carê aliyê kêm 85 bajarên Îranê di meşên nerazîbûnê de beşdarî kirin, û bi vî awayî bû mezintirîn meşa piştî şoreşa Îranê. “Serkutkirina Kurdan di Îranê de li ser du stûnan sekiniye”, eva gotina Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ bû di dema axavtinê de, li ser nivroxwaneke siyasî di “Navenda Londonê li Washington D.C”yê de.

Wî rêzdarî di doma axavtina xwe de rohn kir ku: “Ew du stûn pêk tên ji sistema niha ya siyasî û deshîlata wê ji aliyekî ve, û serkuta neteweyî ji aliyê wî bi nav rewşenbîrê (reformxwazê) Komara Îslamî ji aliyekî din ve”.

Di encamê de siyaseta haşakirina ji nasnameya neteweyî ya Kurdan bi tewahî berçav e. Kurdistana Îranê bi awayekî gellek cuda ji aliyê Komara Îslamî ve serderî digel de tê kirin. Kurdistana Îranê bi giranî ji aliyê rejîmê ve hatiye milîtarîzekirin. Danîna xalên lêgerînê, kuştina xelkê ji aliyê polîs, û rewşa tund ya leşkerî. Her lewra Kurdistan xwediyê kêmترین radaya xwendewar û karpêdayîyan e li raserî Îranê de. Bo mînak tenê du karxane li Kurdistana Îranê de hebûn, ku ew jî ji aliyê xelkê derveyî Kurdistana Îranê hatine avakirin, tenê xelkê xeyrî



Kurd tê de kar dikan, ku ew yek jî bûye sedema çewsandina aborî ya Kurdan.

Mînen çandî canê Kurdan kiriye armanc, û xisareke cubranekirî gehandiye zewiyên çandiniyê, li ber van sedema her sal zêdetir ji 15 hezar Kurd bi armanca bidestxistina kar, ber bi beşên navendî ên Îranê ve koçber dibin. Kurdisatanê ew şîyan heye ku bibe cihekî mezin bo pîşesaziya torîzmê, û çalakiya aborî, lê bi sedema hebûna rejîma Îranê, her derfeteke baştirkirina jiyanê ji wan tê standin. Şêş bajar ji wan deh bajarên Îranê ku zêdetirîn radaya bêkariyê hene, di Kurdisatanê de ne.

Di demekê de ku di derbazbûyî de jî, meşên nerazîbûn li Îranê hebûne, lê meşên vê carê ku di navçeyên Kurdî de dest pê kirin, gihîştin herêmên din jî, û 80-95% ji xelkê Îranê piştevaniya rejîma niha nakin. Di demekê de ku xelk bi giştî rege li pey guherîna rejîmê ve bin, û lawên Îranê daxwazên zêdetir jî dikan. Ew li pey Rojavayîbûn, destpêregihîştina bi înternetê, torên civakî û muzîka rak û ...hwd ne.

Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ hevdem digel lênihêrîna birêveberayetiya serok Trump derheq rêkvevartin-nameya etomî ya Îranê (JCPOA) ye, û wê biryarê wekî boçûrke rastîn dizane, lê derheq bersiva

aliyên din bi taybetî Ewropîyan li ser vê pirsê, heta radeyekê dilsar bû.

Dibe dorpêçên nû bixin ser Îranê, lê hevdem eva girîng e ku dorpêç dibe dorpêçên armancdar bin. Herçend ku dorpêç di kurtheyam de rege derba xwe lêdin, lê di dirêjheyam de derba xwe ya giran û hewce diweşînin.

Guman tê de nine ku rejîm hewl dide dorpêçan dewr lêde-heta ew eger heye ku bi riya Bexdayê ve vî karî bike- lê eva heman tişt e ku tê çaverêkirin, ku bê encamdan, û nabe pêşîya wan bê girtin. Rûsiyê ji Îranê bo armancên xwe yê navçeyî mifah wergirtiye, ji wan zextxistina li ser Amerîkayê. Ew pêwendî ji vir ve em dikarin yekalî bibînin ku Rûsiye mijûl e zextê dixê ser şerkerên biyanî- ji wan Îranê- da ku ji Sûriyê vekêşe, ku ew yek nîşan dide ku hevpeymanîya Rûs-Îraniyan ew qas jî bihêz nine, û cuda ji vî jî dîtingeha wan li ser Îsraîlê cuda ye.

Dema ku em çavniheriya guherîna rejîmê dikan, ew yek jî girîng e, û bo me zelal dibe, ku çî cihê wê digre. Niha girûpên opozisyonê mijûlî karkirina li ser vî yekê ne ku alternatîv çî dibe, lê hêşt bi tewahî li ser sax nebûne, hekî Amerîka wekî hewce cidî be, li ser yarmetîdana xebat bo demokrasîyê rastîn, hewce ye ku ew piştevaniya deshîlata nû bikin,

Birêz Mistefa Hicrî
lêpirsyarê giştî ser vî
baweriyê ye, ku “eva dest-
pêka qonaxeke nû ye di si-
yaseta Îranê de”, û Amerîka
hewce ye piştevanê opozi-
syon û ciwanan be.

ew piştevaniya deshîlata nû bikin, îca her demekê deshîlat girte dest.

Opozisyon li benda leşkerên Amerîkayê li ser erdê nine, belku çavniherê alîkarîkirina Amerîkayê ji xelkê Îranê ye bo pêkanîna guherînkariyan bi awayê aştxwazane di Tehranê de. Ew alîkariya dikare dabînkirina destpêregihîştina rastîn bi înternetê, destpêregihîştina bi torên civakî û perwerdekirina çawaniya mifahwergirtina ji van toran û dabînkirina bedelekê bo televîzyona dewletî ya Îranê be.

Rêxistina hêza nû ya xelkê karekî girîng e. Birêz Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ser vî baweriyê ye, ku “eva destpêka qonaxeke nû ye di siyaseta Îranê de”, û Amerîka hewce ye piştevanê opozisyon û ciwanan be.

-Eli M. Gold cihgirê yekem ê sekreterê giştî ê “Navenda Londonê bo lêkolîna siyasî ye”.

Hevpeyvînek digel Şerîf Hejarî mamostayê zanîngehê derheq terorkirina Dr. Qasimlo û belgenomeyên di vî warî de (Beşa 1)



Şerîf Hejarî: Nirxandin û hevberkirina Dr. Qasimlo û rêberên din ên Kurd digel hevdu, nîşana neserwextî û nehişyariya civaka Kurdistanê ye


Ajansa Kurdpa: Derheq belge-nameyên Wezaretê Karê Derve ya Amerîkayê li ser dosiyeya terorkirina Dr. Qasimlo û li bereberê 29.mîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo de, Ajansa Kurdpayê gotûbêjek digel Şerîf Hejarî encam daye, ku deqa wê weha ye:

Pirs: Ji bilî Amerîkayê kîjan welatî li ser terorkirina Dr. Qasimlo helwest hebûye?

Bersiv: Eşkere ye ku di heyama pêşîn de ku min belge-nameyek li ser helwesta Amerîkayê li hemberî terorkirina Dr. Qasimlo de xiste rû, heya radeyekê helwesta dîplomasiyane ya Amerîkayê derheq terorkirina Dr. Qasimlo bo hemû Kurdekî û heta biyaniyan jî rohn bû!

Vê belge-nameyê gellek girîngiya xwe hebû, û heye jî, jiber ku belge-nameyeke fermî ya Wezaretê Karê Derve ya Amerîkayê bû, û gihîştibû Wezaretên Derve û Wezaretê Dad a Nemsayê. Wate di biyavê zanistî de, ew belge-name wekî helwesta fermî ya dewleta Amerîkayê tê hesibandin, li ser terorkirina Dr. Qasimlo, ku heya niha tu akademî û siyasî û dîrokzan û nivîskarekî, ew zanyarî li ser helwesta fermî ya Amerîkayê bi dest nexistibû, heta ku di vekolîn û mijarên xwe de bixin rû, û şikariyê jê re bikin, yan bo keysa dadgehê jî bê bikaranîn!

Wekî belge-nameya fermî heyamek e ku ez li pey vê pirsê ketime, û cuda ji vê belge-nameya biqîmet û buhagiran ya Wezaretê Karê Derve ya Amerîkayê ku min belav kiriye, vê heyamê jî bi hewla bêrawestiyan, min karî ku çend rûpelan ji belge-nameyên nav parlemana Nemsayê jî, bi dest bixim, ku taybet e bi nîqaşa di nava parlemana Nemsayê de, li derheq keysa terorkirina Dr. Qasimlo de.



Di van çend rûpelên belge-nameyî ên behs û nîqaşa di nava parlemana Nemsayê de, ku rêkewta wê vedigere bo (06.05.1997) an, rast dema civînê ji demjimêr 12'an ve dest pê dike, heya demjimêr 7:39 deqeyan, û çend keysên weha di vê civînê de kar li ser hatiye kirin ku yek ji wan: Keysa terorkirina Dr. Qasimlo bûye. Belgenome çendîn rûpel e, lê navika behsê ser vê ye: ((Gellek ji parlamantarên Nemsayê, wekî (Dr. Heydî Sikmîdit ji partiya Lîberal foryom) û (Rodolf Anşober ji partiya Kesk a Nemsayê), û (Dr. Hêlîn Patrîk parlamantar ji Hizba Azadî ya Nemsayê û hinek parlamantarên din jî) bi pirsyarekê li jêr navê (Terorkirina Kurdan li Nemsayê) ku piştê zelaltir dikin ku mebesta wan, (terorkirina Dr. Qasimlo û Ebdullah Qadirîazer e, bas li ser dikin, û daxwazê ji serokê parlemana Nemsayê dikin ku şopandin hebe, ku gelo lêkolînên dewleta Nemsayê û lêkolînên Wezaretên Navxwe, Derve, û Dad a Nemsayê çima hatine ragirtin?.

Piştê jî parlamantar (Rodolf Anşober) dipirse: Bo çi dewleta Nemsayê terorîst e û tawankar jî bi awayekî azadane şandine

Îranê?!

Îca parlamantar (Dr. Hêlîn Patrîk ji Hizba Azadî ya Nemsayê) îşareyê bi vê yekê dike: çima çi rohnkirinek tune ye derheq derbazkirina azadane ya terorîstan ji Nemsayê ve bo Îranê?! Piştê behs tê ser vê ku hinek ji par-

terorê, lê ew daxwaza rewşa û yasayî tê retkirin, bi bê tu sedemekê!!.

Ew zanyariyên ku min bas kirin, belge-nameyên fermî ne, ku min bi dest xistine, hem yê Wezaretê Derve ya Amerîkayê, û hem jî yê nava parlemana Nemsayê.

lemanteran sirrekê eşkere bikin, ku ew jî ew bûye ku dewleta Nemsayê û navendên têkildar çendîn belge-nameyên zelal li ber dest de hebûn, ku tawanbar di welatê Nemsayê de bûn, û li ber destên wan bûn, lê dewleta Nemsayê û wezaretên pêwendîdar nexwastine ku biryarê li ser tawanbaran bidin!

Piştî çendîn nîqaş û gengeşeyên din îca serokê parلمانê (Dr. Heynz Fîşer) dibêje: (Terorkirina Dr. Qasimlo li Vîyenê bêbawerbûna bi wezaretê Derve ya Nemsayê zêdetir nîşan da, û gellek nîşaneyên pirsê li ser pêwendiyên Nemsayê û Rejîma Îranê eşkere kirin, ku serpoşdanîna li ser terorkirina Dr. Qasimlo li Vîyenê bû sedema vê ku rêberên din ên PDKÎ rasterast ji aliyê Îranê ve bibin armanc, û piştê rêberên din jî li Almanyayê bêne terorkirin, lê li wir li dageha Mîkonosê de, dewleta Îranê wekî terorîzma navdewletî hate mehkûmkirin! Ew nîqaş çend demên din jî dom dike, û gellek zanyariyên din jî tene eşkerekirin. Di dawiyê de daxwaza pêkanîna komîsyoneke lêkolînê dikin, li ser bêdengiya demûdezgehên dewletê derheqê

Ew yek wekî helwesta fermî ya nav dem û dezgehên dewletî ên Amerîka û Nemsayê bûn!

Lê ew daxwaziyan rewşa û yasayî tene retkirin, bi bê çi sedemekê!!.

Lê wekî helwesta tak, çi wek wezîr û çi wek serkirdeyên siyasî ên Ewropayê, zelal e ku çendîn mînak hehe, her ji serkirdeyên hizban, û wezîrên Fransayê ve bigre heya serkirdeyê hizbên opozisyon ên Nemsayê. Her çend ku ji 2011'an ve nasnameya (Arşîvخانهya neteweyî ya Berîtanî) min heye, heya niha ez wekî (Şerîf Hejarî) bi hûrî van belge-nameyan hildikolim, lê çi dest min neketiye, li ser helwesta Wezaretê Derve ya Berîtanyayê, derheq terorkirina Dr. Qasimlo ve, lê xatircem im di pêşerojê de ezê bi dest bînim, jiber ku ez nakevim qedeman.

Eşkere ye ku metirsiyên tirsna jî li ser jiyana min û terorkirina min hebûne, û hene jî. Belgenomeyên derheq hebûna metirsiyê li ser terorkirina min li cem dadgeh û polisê Kurdistanê hene, û beşeke van belge-nameyan ên dadgeh û

polîsên Kurdistanê li ser terorkirina min bi zimanên (Almanî, Îngilîzî, û Farsî) hatine belavkirin, û di vê derheqê de, di çend welatên Erebi de tene belavkirin. Lê pêdagirî dikim ku bi hewla bê rawestiyên heya dawî henaseya xwe kun bi kunê arşîvaxaneyan bigerim û hewla vedîtina belgeyên din bidim, û di vê derheqê de belgeyên din jî ezê dest bixim, û belav bikim.

Herçend ku hekî bi tewahî ew belgeyên nava parlemana Nemsayê ku min bi dest xistine (ku bi zimanê Almanî ye) bikin Kurdî, bi awayekî zelal bikerên kiryarê, û îşkorkirina wan bo Tehranê ku bi fermî dewleta Nemsayê û Wezareten Navxwe, Derve û Dad ya Nemsayê bûn, tê selimandin.


Pirs: Di arşîva welatên Ewropî de çawa bas ji Dr. Qasimlo hatiye kirin?

Bersiv: Qasimlo di belgeyên veşartî ên Wezareta Derve ya Berîtanyayê de, û ji dîtingeha diplomatkarên Berîtanî ve (ku hinek ji van belgeyên nepenî, di çend pirtûkan de min çap kirine), wekî siyasetzaneke bêhevta di gengeşeya siyasî û xwediyê serxwebûna biryardanê di siyaseta de, û xwedî şîyan di çendî hunerên siyasî di çawanîya rakêşana aliyan di diplomasiyê de, hatiye binavkirin!

-Qasimlo li cem Feransiyan wekî ensîklopîdiya hatiye hesibandin. Wateya ensîklopîdiya, her bi tenê siyaseta û diplomasiyê nagire, belku di demekê de ku nuxbeya siyasî ya Ewropî peyva ensîklopîdiya bo karakterekê bi kar tînin, dibe ew fîger (hekîm), yan xwe: feylesûf be.

Boçûna Firansiyan û nameyên wan rast wekî lênihêrîna Dr. Şerefkendî ye li ser Dr. Qasimlo, ku ew jî îşare ye bi vê ku Qasimlo hekîm ya bixwe feylesof bûye! Dema ku siyasîyên Fransî dibêjin: ((Li tewahiya cîhana rojhilat, Qasimlo di dîroka xwe de taqane bû!)), eva tê çi watayekê?! Wate: Qasimlo, diyardeyeke bêhempa bûye! Ku hinek ji siyasîyên navdra ên Fransayê Qasimlo wekî peyamber, bi nav dikin!

-Di van deman de ku bi sedema kiryara hinek ji hizbên Kurdî, hewla vê dihate dan, ku tevegra neteweyî di nava parlemanên Ewropî de wekî terorîst binasîne,



Madam Mîtran di nava parlemana Fransayê de dibêje: ((Em çawa dikarin bizava neteweyî ya neteweyekê bi terorîst binasînin, ku rêberên wekî Qasimlo tê de hilkewtibin, wî mirov neçar bi bîrkirinê dikir!)).

Eşkere ye ku destewajeya: (Wî mirov neçar bi bîrkirinê dikir!) wate Qasimlo hekîmê bexşîna ciwanîyê bû bi jiyanê, bîrmendek bû ku gotin û kiryarên wî wisa li kesê pêşberî xwe dikir, ku bi piştqahîmiya bi -bîrkirinê- bi vê hizra eqlanî nasyar bin, ku ji jiyarên cuda ên di nava civakê de heyrîmayî dimînin, û digihîjin vê baweriyê ku: Bi bê cudahî, mafê azadiyê wek yek bo hemû regez û çîn û neteweyan bê qebûlkirin, û ew bawerîya li cem mirovan çê dibe.

(Wekî Şerîf Hejarî ger bas ji belgeyên ersîvên Ewropa û dîtina Ewropayîyan derheq Dr. Qasimlo ji we re bikim, bi çend kitêban tewaw nabe, heya niha jî: Ne hinek ji kadrên hizba wî, û ne jî gellek ji takên neteweya Kurd jî, wekî Ewropîyan-bi vê şeweya kûr, ji Qasimlo û hizrên wî tenegehîştine), lê îşareyê bi çavkaniyeke din dikim, ew jî belavoka (The Times) e, ku di roja Şemiyê 15.07.1989, li rûpela 16 de, mijarek li ser terorkirina Dr. Qasimlo dixêrê.

Deq bi deq çend xetên destpêkê, û dawîya babetê weha ye: ((Qasimlo fîgerê herî girîng ê siyasî ê Kurd bû di vê serdemê de. Bi sê hezar partîzanî gellek caran spaha Îranê tîk dibir, ku zêdetir ji 200 hezar serbazî heye.

Qasimlo ji meha sê ya sala derbazbûyî ve gellek li Sedam nêrehet e, bi sedema kîmyabarana Helebçeya Kuran, û di tewahiya civînen Ewropayê de jî, ew bas anîye holê.

Qasimlo rêberê Kurd ê herî rewşenbîr bû, ku di dîrokê de heta niha Kurd berhem anîbe!. Di van deman de ku Dr. Qasimlo dem hebû, ew navneda herî çalak û bêhevta ya hilîncana bawer û ponijînen pirr ji behs û gengeşe bû. Di serdanên xwe yê salane de jî bo Parîsê, gellek caran li kaftiryayeke ser şeqameke navenda bajar dihat dîtin, û bîstekê li wir dima. Lê di vê dema kurt de jî, helbestvanên jin û hozanvanên mîr yê Fransî dewra wî kom dibûn!. Qasimlo piştî xwe du keç bi cih hêlan!)).

Pirsyar: Çima heya niha Kurd nekariye ku keysa terorkirina Dr. Qasimlo bixwe ger. Sedem çi ne?

Bersiv: Vê pîrsa te sedema serekî heye, û sedemên din jî hene!

1-Sedema serekî, sedema herî tîrsnak eva ye ku heya niha dewleta Nemsayê bizanebûn, û bi dilê xwe, bi tu awayî naxwaze ku vê keysê bixwe biyavê yasayî de, baştirîn belge jî her du belgeyên (Wezareta Karê Derve ya Amerîkayê ne bo dewleta Nemsayê, û gengeşeya nav parlemana Nemsayê).

Di gengeşeya nava parlemana Nemsayê de bi zelalî parlemantarên Nemsayê bi belge ve navê terorîstên bikuj birine, û parlemantar jî bixwe sersam bûn, bi vê ku: Bo çi heta niha jî, dewleta Nemsayê bi tu awayekî naxwaze tu lêkolîneke yasayî di vê derheqê de bê kirin, û heta ret jî dikin, ku lêjneyeke lêkolînê ya parlemanî jî bo vê keysa terorkirinê danê!?. Hekî ne ji wan belgeyên Wezareta Derve ya Amerîkayê ku min belav kirine derdikeve ku: Nemsajî destê wê tevlî vê pîlana biyom û tîrsnak bûye. Jiber ku Amerîka dibêje Nemsayê ku: Di pêxema rêgirîkirina ji terora navdewletî dibe ku tu wekî Nemsajî van tevdîran bo keysa terorkirina Dr. Qasimlo bigrî pêş.

Dema ku Nemsajî rêbazên yasayî nagire pêş, tê vê watayê, ku Nemsajî bixwe jî, di pêxema berjewendiyên aborî ên xwe de, û li pêxema nefta Îranê, û firotina çekan bi Îranê, rewş ji bo revîna

terorîstên Îranê xweş kiriye, û piştî jî bizanebûn, nehêlaye ku lêkolîna yasayî ser vê keysê bê kirin.

Eva di biyavê eqlanî û lojîkê de Nemsî jî tawanbar e, û hevbeş e di vê kiryara terorîstî de! Heta parlemantarên Nemsîyê bixwe jî li belgeyên parlemana Nemsîyê de bas ji vê dikin ku:


Di pêxema berjewendiyên aborî û sat û sevdîyên dewleta xwe digel Îranê, xwîna Qasimlo kirin qurbanî! Îşareyê bi vê jî dikin ku: Her eva jî bûye sedem ku piştî rejîma Îranê dest bi kiryarên terorîstî bike, jiber ku di terora viyenê de jê re baş çû pêş!.

2-Lawazbûna PDKÎ piştî Qasimlo, sedemê din e ku keysa Dr. Qasimlo nekeve ser biyavê xwe yê yasayî. Lawazî û şepirzeyiya heykela giştî ya PDKÎ, piştî Qasimlo, bi taybetî piştî vê ku bi pîlan ve PDKÎ ji Qendîlê anîn xwar, ji aliyê hêzeke Başûr ve.

Ger Navenda Giştî ya PDKÎ bihêz bibe (hêvî dikim bihêz bibe), wê tîhn û gurriyêkê baştir bibexşe tewahiya organên rêxistina derve. Herçend ku dikarin li ber vê ku navenda PDKÎ zexteke zêde ya pîlanên terorîstî li ser hebûye li başûr de, eva komîte û dîplomasiyeta Ewropa û Amerîka û Kanada û heta lînka wan jî digel Tîrkiye û Îsraîl û Erebîstanê gellek bihêztir kiriban. Lê min jêve ye ku: Niha jî PDKÎ li ser Xermana pîrr-berhem a (Bîrmend û rêberê bêhempa yê Kurd Dr. Qasimlo) dijî. Di rastî de eva kêşe ye, jiber ku dibû di van nêzik bi sî salan de ku bi ser terorkirina Dr. Qasimlo re derbaz bûye, gellek pêşveçûn, bi taybetî di modern-tirkirin û biqavetirkirina rêxistin, û pêkhatiyên din ên rêxiraweyî de pêk hatiban.

Çawa ku bo navxwey Rojhilata Kurdistanê, bizava Rasanê hewce ye ku bi stratejiyê hûrtir kar li ser bê kirin, wisa jî bona bihêzkirina komîte û rêxistinên derve û dîplomasiya derve, dibe ku PDKÎ stratejiyê modern û biqavet û pîrr cemawerî çê bike, ku bi hûrî bê cîbicîkin!

Mesele eva ye: Dibe ku heykelê giştî ê PDKÎ hevkar û harîkar be ku komîte û nûneratîyên derve bihêz û moderntir bikin. Ew hemû endamên PDKÎ li derve, gellek ji wan jî bilî çalakiya facebookê,



gelo tekoşîna wan kîjan e?!

Xwe hekî beşeke kêşeyê ya endamên wê be, eva beşa serekî ya kêşeyê, navenda serekî ya PDKÎ ye, ku bi başî nekariye bi van hemû endamên xwe ên derve, berhema giraniya (siyasî û dîplomasiyê) bi dest bixe, û bixe ger. Stratîjî û pîlan dibû eva bûya: çawa û bi kîjan nexşerîyan pêwîst bû qazanca siyasî û dîplomasiyê ji hemû endamên derve wergirin?!

Niha PDKÎ Navenda Siyasî heye, navendeke wisa dibe ku xalên lawaz ên derveyî hizba xwe diyarî bikin, û bikarin ku bi çend stratejiyan ve tewahiya sêkterên hizbê çalak û bihêz bikin, bêguman dibe ku hemû heykelê PDKÎ yekdest û hevkarane di yek bi yek ji sêkterên hizbê de kar bikin, da ku bihêz dibe!.

Dibe ku Navneda Siyasî hêza darêtin û cîbicîkirina dehan ecênda û çendîn stratejiyan bona tokme û qahîmkirina biyavên cur bicur ên heykelê rêxirawê hebe. Ger nebe û şûndestê ecênda û stratejiya han diyar nebe, eva şiyana hizrî ya endamên Navenda Siyasî ye ku di biyavê çêbûna tîza siyasî-lojîkî û çareseriyê de, dikeve jêr pirsyarê!.

Xatircem im ku ger PDKÎ bê biqavetkirin, û komîte û nûneratîyên derve jî moderntir û çalaktir bibin, wê demê bi awayekî bibandortir wê tekoşîn û zexta xwe çê bikin, heya wê dema ku keysa terorkir-

rîna mezine bîrmendê bêhempa (Qasimlo) dixin ser biyavê yasayî ê xwe! Rohn e jî ku moderntirkirin û çalaktirkirina wan, li çendîn biyavên siyasî û dîplomasiyê û heta aborî jî bandora xwe dibe li ser bihêzkirina heykelê navxwe yê PDKÎ û bi taybetî ber bi pêşvebirina doza Kurd bi giştî.

Zêdetir ji vana jî, darêtin çendîn stratejiyên tîr û tejiyê bona karkirina li ser Kurdên Lor û Kurdên Bextiyarî û sînoren Rojhilata Kurdistanê, hemû dibe karê hûr yê Navenda Siyasî a PDKÎ be, û stratejiya wan jî bandor hebe, û bê cîbicîkin!

3- Bêemegiya hizbên Başûr li hemberî xwîna Dr. Qasimlo, û peyrewiya hinek ji wan ji rejîma Îranê.

Digel vê de ku her ji yekem dema terorkirina Dr. Qasimlo de (belge li cem min heye), serkirdeyê diyar ê başûr hebûye, ku daxuyanî daye ku hizba Be'îs bi terorkirina Dr. Qasimlo rabûye, û ew kiryar, Partiya Be'îs encam daye! Bêyê ku ew serkirde ji vê yekê bifikre ku keysa dadgehê maye, dibe daxuyanîyê belav neke, ku zirarê bigehîne keysa terorkirîna li dadgehê, û bîra lawên nehişyar ên Kurd ji rê derxe, û qazanc hebe ji bo revîna terorîstên tawanbar! Lê Hikûmeta Herêmê jî bi vê zêdetir ji çarîkek sedsal a temenê xwe ve, ger bi dizî ve jî be, dibû kar li

ser vê keysê bikiriba, yan jî xwe: bi awayekî nepenî wisa kiriba ku: keysa terora bîrmendê mezin (Qasimlo) ketiba ser biyavê yasayî yê xwe! Lê dema ku ew Seharûdî tînin û li zonên xwe de (kebab)an jê re lê didin, û (singê eloşîşkan) ji wan re diqelînin, û dehan kesên wekî Mensûr Reşî Hewramî dikin qurbanî, û diyarî bo bixêrhîna Seharûdî, êdî çawa dibe ew ew pirsyar bihê kirin ku: Gelo çima bizava Kurd nekariye keysa Dr. Qasimlo bixe ger!.

Eşkere ye ku hizbê Başûra Kurdistanê, deshilat û aborî û dîplomasiyê û dadgeh di destên wan de ne, û hemû kare ne, û dikarin di vê keysê de roleke girîng bilîzin, lê li hinek ciyên jêr deshilata xwe de, Demokratqîran e, û terorkirina Demokratîkan berdewam e! mirov dibe ku xwe ji wan biparêze, ku terorê nekin, ne tenê çavniheriya vê yekê li wan bikin, ku keysa terorkirina Dr. Qasimlo bixin ger! Ew Qasimlo nînin, ku neteweyekê ew çavniheriya ji wan hebe!.

Şev û rojan rûniştîyên Herêma Kurdistanê dest bi destnimêj û du'ayan dikin, ku hizbên Başûr yektir nexon, û Heşda Şe'ibî û Pasdaran nehînin û kerkûkeke din pê nebexşin, bo vê keysê gelo dibe ku me çî çavniheriyek ji wan hebe! Xweda bike ku ew bi hev re şer nekin, û Heşd û Pasdaran nehînin ser hevdu, êdî hewce nake, ku em çavniherî wan bin ku di pirseke din ya neteweyî de hisab li ser

»»» Dom R:8

Nerîna Lîderan



Trump:

“Dibêjin Potîn endamê KGB û hwd ... bûye, lê Potîn baş e”.



Hayko Mas:

“Mezinhêzên cîhanî nikarin ew xisara ku li encama dorpêçên aborî ên Amerîkayê digîjin rejîma Îranê, qerebû bikin.”.



Ruhaî:

“Paketa pêşniyarî ya Ewropîyan bo parastina Bercamê cihê nîgeraniyê ye”.



Ce'iferî:

“Bikaranîna tengeya Hurmuz yan bo hemiyan dibe, yan bo tu kesî nabe”.

Rêveberê Pilandanîna Wezaretê Derve a Amerîkayê behsa terora Dr. Qasimlo dike

Rêveberê Pilandanîna Wezaretê Derve a Amerîkayê di konferanseke rojnamevaniyê de terorkirina rêberê karîzma û netewî yê Kurd, Dr. Qasimlo li bajarê “Viyenna” ya Nems (Otrîşê)ê, di derbarê berfirehbûna terorîzma dewletî a Îranê hişdarî da.

Roja Duşemiyê 11'ê Pûşpera 1397'an (2'ê Tîrmeha 2018'an) “Brian H. Hook” rêveberê Pilandanîna Siyasetê Derve a Amerîkayê, behsa serdana Hesên Rûhanî serkomarê Îranê ji bo Swîs û Otrîşê kir, û got ku li gor raporan, Hesên Rûhanî serdana Swîs û Otrîşê dike û hewl dide hevrêziyê di navbera welatên Ewropî û hikûmeta Îranê de pêk bîne.

“Brian H. Hook” tekezê dike ku serdana Rûhanî ji bo “Viyenna”yê, di vê mehê de nêzikî salvegera terora yek ji dijberên hikûmeta Îranê di bin navê dîplomasiyê de ye, ku tê de rêberê partiyeke Kurdî û cudabîrê hikûmeta Îranê û du kesên din hatin terorkirin, û ev cihê heyrîmayînê ye.

Herwisa da xuyakirin ku ewê di

heyameke kurt de derbarê hewlên tundûtîjiyê yê hikûmeta Îranê, hewlên terorê, danîna bombeyan, êrîşa saybêrî, girtin û dizîna xelkê, barimte-girtina xelkê û dizîna balafiran ji aliyê hikûmeta Îranê ve bi welatên cîhanê re gotûbêjê bikin.

Rêveberê Pilandanîna Wezaretê Derve a Amerîkayê herwisa got dema ku em dibînin kesekî weke Rûhanî serdana Ewropayê dike, û hewla pêkanîna hevrêziyê bi wan re dide, dîrokeke xemgîn çê dibe. Ji ber ku hikûmeta Îranê ji sala 1979'an ve tundûtîjî li hemberî welatên Ewropî encam daye.

Wî di dawiya konferansa rojnamevaniyê de got jî, divê Ewropî bizanin bi rejîmeke çawan re li hev dikin. Roja 22'ê Pûşpera 1368'an (13'ê Tîrmeha 1989'an) Dr. Ebdurehman Qasimlo bi Ebdulla Qadîrîaz-er û Dr. Fazîl Resûl re li ser maseya danûstandinê bi nûnerên Komara Îslamî a Îranê re, ji bo çareserîya aştiyane a pîrsa Kurdistanê Îranê li “Viyenna” a paytexta Otrîşê hate terorkirin. Beriya niha rojnameya “Diepress” a çapa Otrîşê, terorki-



rîna Dr. Ebdurehman Dr. Qasimlo, sekreterê berê ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê li “Viyenna”yê weke reştîrîn bûyerên dîroka Otrîşê binav kiribû.

CNN: Koşka Spî dixwaze Spaha Pasdaran bixe nav rîzbenda rêkxirawên terorîstî de

Kanala CNN ji zimanê çavkaniyekê di dewleta Amerîkayê de ragehand ku Koşka Spî bona zêdekirina zext û givaşan li ser hikûmeta Îranê mijûlî nîrxandina vê mijarê ye, ku baskê leşkerî yê wê wekî Saziyeke terorîstî bi nav bike.

Berpirsyarên payebilind ên Amerîkayê bi CNN ragehandine, ku ew di halê lêkolîna li ser vê pîrsê ne, ku Spaha Pasdaran wekî saziyeke terorîstî ya derekî bidin nasand. CNN di dirêjiyê de radigehîne ku ew behs li ser maseya Wezaretê Karê Derve ya Amerîkayê ye, û hekî bê pejirandin, ew wekî siyaseta Amerîkayê ya êrîşkarane li dijî rejîmê tê hesabandin.

Hinek ji berpirsên Amerîkayî derheq biryareke weha û egera hebûna metirsiyan li se rriya berjewendiya Amerîkayê û êrîşa li ser hêzên Amerîkayî li derveyî sînorên Amerîkayê hişdarî dane, lê hinek jî dibêjin ku biryareke weha wê



deshilatê dide Koşka Spî ku heyyên Spaha Pasdaran asteng bike, û qedexeya serdankirinê danê ser berpirsên Spaha Pasdaran û dorpêçên nû jî bixe ser vê navenda leşkerî ya terorîstî.

CNN di doma rapora xwe de ji Mike Pompeo wekî alîgirê vê pîlanê nav dibe. Dema ku Kanadayê navê Spaha Pasdaran xistibû nava rîzbenda rêkxirawên terorîstî de, Pompeo bi belavkirina twittekê ragehandibû: Amerîka piştgiriya dide vê biryara Kanadayê. Xelkê Îranê li hemberî reftarên xirab ên rejîma Îranê de bêdeng namînin. Ew ji wan piştevaniyê dikin, û daxwazê ji welatên din dikin, ku hesaba rejîmê bidnê.

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê daxuyaniyek belav kir

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê ji nevendên mafên mirovan û azadîxwazan dixwaze ji bo rêgirtin ji darvekirina girtiyeke siyasî ê Kurd, nerazîtiya xwe li hemberî rejîma Îranê bînin ziman.

Daxuyanî wiha ye;

Daxuyaniya Navenda Hevkariyê derbarê egerên darvekirina xortekî Kurd

Xelkê bi rûmet ê Kurdistanê!
Navendên mirovdost ên parêzvanên mafên mirovan!

Desthilata reş a Komara Îslamî a Îranê di 40 salên derbasbûyî de bi armanca qutkirina dengê azadîxwazên neteweya me û berde-wamkirina biryarên nerewa ên xwe, hemû şeweyên tepisandinê ceribandine û xirabtirîn û çewt-tirîn şewazên tepisandin û tawan li hemberî neteweya me bi kar anîne.

Gelê Kurd li Kurdistanê Îranê di warê rêjrya darvekirinê siyasî de di asta herî jor a rêzbendîyan de ye û xortên me bi hêncet û tometên nerast tene darvekirin. Niha jî ku kirîzên cuda, derdora dîktatoriya melayan girtine, her roj pirsgerêkên siyasî ên navdewletî û navx-we berfirehtir dibin û bê guman rejîm ji her demeke din zêdetir ji teqîna kerb û hesta tolhildanê a neteweyên Îranê ditirse, ji ber vê rêjeya darvekirinê bilind dike û wê jî weke çareseriyek bi armanca tirsandina azadîxwazan ji vê desthilat û sîstema dijî azadîxwazan bi kar tîne.

Di berdewamiya tawanên rejîma Tehranê de li hemberî gelê me, vê carê jî xortekî bê tawan ê Şinoyî bi navê “Hidayet Ebdullapûr” bi tometa alîkariya Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê rastî kerb û kîna berpîrsên xwînrij ên rejîmê hatiye.

Navhatî beriya niha di bêdadgehên Komara Îslamî a Îranê de bi 30 salan girtîgehê hatibû cezakirin û di pêdeçûna dadgehê de bi destwerdana Sipaha Pasdaran, ew biryar ji bo darvekirinê hate guhertin û niha jî egera darvekirina wî zêde bûye.

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê vê biryara nerewa şermazar dike û ji tevahiya azadîxwaz û navendên mafên mirovan di asta navdewletî de dixwaze, dengê nerazîtiyê derheq vê tawanê hildin, û bi givaşên navnetewî û giştî, rê li ber darvekirinê siyasî û îdama Hidayetan û Ramînan bigirin.

**Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê
15'ê Pûşpera 1397'an a Rojî
(6'ê Tîrmeha 2018'an a Zayînî)**



Hêzên rejîmê dest bi dizîn û talankirina milk û malên xelkê kirine

Hêzên dagirker ên Kurdistanê li bajar û navçeyên Şinoyê dest bi dizîn û talankirina milk û zeviyên xelkê kirine û her tiştê ku dest wan dikeve, talan dîkin.

Talankirin, wêrankirin û dizîna mal û semyanên xelkê, karê hertim ê hêzên dagirker û armanca sereke a dagirkirina axa Kurdistanê jî talankirina mal û semyanên netewa Kurd e.

Êvariya Çarşemiyê 13'ê Pûşpera 1397'an a Rojî (4'ê Tîrmeha 2018'an a Zayînî), pasdar, caş û kirgirtiyên rejîmê matoreke avê a nav bax û rezên xelkê gundê Sewce ê Şinoyê dizîn. Ew hêz ji bo rêgirîkirin ji xebata xelk û pêşmergeyan li Kurdistanê hatine bicîkirin û xwe weke parêzvanên xelkê binav dîkin. Lê bi karên xwe yên qirêj, rûyê xwe yê rast nîşanî xelkê û raya giştî a Kurdistan, navçe û cîhanê didin. Heman rojê, hêzên rejîmê li gundê Xanler ê Şinoyê bi zorî nan û xwarin ji xelkê standine.

Ev diyarde ji aliyekî ve siruştê çewt ê dagirkerane yê hêzên rejîmê ye û ji alî din ve rastiye nîşanî raya giştî dide ku dorpêçên aborî ên Amerîka û welatên din ên zilhêz çiqasî bandor kirine ser aboriya rejîmê.

Goşegirbûna rejîmê di warê siyasî de û jidestdana baweriyê di civaka navdewletî de, siyaseta zordarî û totaliteriyê di rêveberiya welat de, dizîna semyan û nan û xwarinên xelkê ji bo dabînkirina locestîk a girûpên terorîstî li dervey welat, rewşeke taybet li navxwe pêk aniye ku rejîm nikare wê çareser bike. Ji ber vê, roj bi roj rejîm ji aliyê welatên zilhêz û pêşketî ve rastî givaşên aborî û siyasî tê, û di asta navxwe de jî nerazîtiya xelkê berfireh dibe û ev xelk, wê biryara xwe a dawiyê bistîne.



»»»» Doma R:6

û Heşd û Pasdaran nehînin ser hevdu, êdî hewce nake, ku em çavniherî wan bin ku di pirseke din ya neteweyî de hisab li ser wan bê kirin!.

Niha gelên Îranê bi berdewamî tene ser şeqaman, û dixwazin ku îmamê xwe yê decal ramalin, û merg bo paşmayiyên rejîma

Xomêynî bûye gotara şeqama giştî ya neteweyên nav Îranê, lê em dibînin ku (reformxwazên deshilatdar ên Başûr) bi êşkere bangewazê bo pêkanîna: (Bereya îmamê berêz) dîkin!!.

4-Berjewendîxwaziya cîhanê sedemeke din ya piştguhixistina karpêkirina yasayê ye di keysa

terorkirina Dr. Qasimlo de, û digel de jî, hebûna Îranê wekî navendeke terorîstî ji sala 2001'an ve di nayeçya Rojhilata Navîn de, ku xwediye jeopolîtîkeke girîng û neftdar e, wisa kiriye, ku dewlet hesabê bo pêwendiyên xwe yên bazerganî bikin, heta vê ku perûşê karpêkirina yasayan û xistineger a bendên yasayî bin.

Hemû ew rastiyan bûne sedema vê ku, xwîna hekîmê bêhempa yê riya tekoşîna (wekheviya di navbera mirov û neteweyên cuda de) bikin qurbanî, û di dema terorkirinê de jî ew qas zulm lê bê kirin, ku yasayên welatên pêşkevî jî, bixin bin piyê terorîstên tawan-kar ên bikujê: (Qasimloyê rêber û zana de). **Dom heye...**

Nebûna Îdareya Mîratên Çandî di bajarê Selmasê de, riyek ji bo helandina nasnameya neteweya Kurd

Nebûna Îdareya Mîratên Çandî di bajarê Selmasê û gefên jinavçûna asewarên dîrokî yên vî bajarî beşeke din ji siyasetên rejîma Îranê ye ji bo jinavbirina nasname û dîroka Kurd.

Bajarê Selmasê girêdayî parêzgeha Urmiyê ye, bi hebûna 63 şûnewarê dîrokî û cihê geşt û seyranê, wekî yek ji bajarên dîrokî û dewlemend ê parêzgeha Urmiyê tê naskirin.

Hindek ji asewarên dîrokî yên vî bajarî wiha ne: “Hemama şêx, Sûlava Xurxure, Sûlava Temir, Kilîsya Hewtewan, Kilîsaya Xusrew ava, Talava Çîçek, Berdenivîsa Xan textî”.

Ev bajara tevî hebûna derfeta baş ji bo geşt û seyranê, lê mixabin piştî derbazbûna 40 salan bi ser temenê vê rejîmê, heyânî niha jî xwediye Îdareya Mîratên Çandî nîne. Ji aliyekî din ve, ev asewarên dîrokî tene talankirin.

Li gorî rêjeya pilebendî ya Saziya Mîratên Çandî, dibe ku pileya vî bajarî bigihîje 90’î heta ku bibe xwediye îdareya mîratê, û eva jî di demekê de ye ku, li gorî hewlên xelkê vî bajarî pileya 83 heye, û ev bajara derfeta vê heye ku bibe xwediye îdareya mîratên çandî. Li gorî lêkolînan, bajarê Selmasê û girên derdorê, vedigerin bo 7 hezar salî pêş Zayînê, wate bo serdema Someriyîyan di navçeya Mezopotamiyayê yan Kurdistanê niha. Karnasên asewarnasiyê li ser vê baweriyê ne ku, berpirsên rejîma Îranê, heyânî niha ne tenê tu gawek ji bo parastina asewarên dîrokî yên vî bajarî negirtine pêş, belku bixwe beşek ji sedema herifîn û jinavçûna van asewaran in. Siyasetên piştguhixistinê ên rejîma Îslamî ya Îranê, derheqê asewarên dîrokî de wisa kiriye ku, pêvajoya jinavçûna mîratên dîrokî û çandî yên Îranê, û bi taybet yên Kurdistanê bilezbûnekê bi xwe bigire.



Rejîma Îranê mohleteke din pê hate dan

Girûpa taybet a malî ya “FATF” bona reforman di yasayên xwe de, mohleteke 3 heyvî da Îranê, da ku dawiyê bi siyaset û bernamêyên spîkirina pere û dabînkirina beşa malî ya terorîzmê bîne.

Li gorî raporên belavbûyî, girûpa taybet a malî ya “FATF” ku navenda vê di welatê Firansayê de ye, ji bo careke din navê rejîma Îranê di derveyî listeya reş ya xwe de tomar kir, û mohleteke din da rejîma Îranê ku dev ji spîkirina pere û dabînkirina beşa malî ya terorîzmê bîne.

Di vê daxuyaniyê de, ji 37 welatên cîhanê daxwaz hatiye kirin ku, bi hişyariyeke tewaw ve digel rejîma Îranê mîamilayan encam bidin.

Di sala derbazbûyî de jî, belavoka “Polîtîko” ku navenda vê di Amerîkayê de ye, di raporteke xwe de bas ji spîkirina pere ji aliyê rejîma Îranê ve kiribû.

Hevdem navenda navneteweyî ya “Bazil” ya di Swîsê de ku taybet derheqê pîrsa spîkirina pere, û rûbirûbûna li dijî terorîzmê kar dike, di rapora xwe ya herî nû de ku di sala 2017’an de belav kiribû, daye eşkerekirin, ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê yekemîn welat e di cîhanê de, di warê spîkirina pere, û piştevanîkirin ji terorîzmê.

Li gorî vê raporê, ji sala 2012’an şûnda, welatê Îranê bi awayekî berdewam yek ji metirsîdartinê welatên cîhanê bûye, ji bo pîrsa spîkirina pere, û piştevanîkirin ji terorîzmê.



20 Kedkarên şaredariya bajarê Serdeştê li ser kar hatine derxistin

Saredariya bajarê Serdeştê ev heyama 6 mehan e ku heqdestê kedkarên xwe nedaye.

Li gorî nûçeya ku gihîştîye Ajansa “Kurdpa”yê, di çend rojên derbazbûyî de, şaredariya bajarê Serdeştê, 20 kes ji kedkarên xwe li ser kar derixistine, û herwiha ev heyama 6 mehan e ji heqdest ji wan re nehatiye dayîn. Çavkaniyeke haydar ji zarê yek ji kedkarên şaredariya bajarê Serdeştê ragehandiye ku: şaredariya bajarê Serdeştê kar daye peymankaran, û peymankar jî digel 20 kedkarên vê şaredariyê pakanehesab kiriye. Li gora gotina vê çavkaniyê, 20 kedkar ji aliyê peymankarê vê şaredariyê

ve hatine derxistin, û ne tenê heyama 6 mehan e deqdest wernegirtine, belku ew bîme jî nekirine.

Her di vê pêwendiyê de, bi sebeba qerdarbûna şaredariya bajarê “Tikabê”, kedkarên vê navenda xizmetkirinê jî ev zêdeyî 3 mehan e ku heqdest wernegirtine.

Piraniya kedkarên şaredariyan bi sebeba nebûna kar, bi pereyê kêmkar dikin, û serbarê heqdestê kêmkar, mehane bi awayekî girêbest jî kar dikin.



Roman û helbest

Helbest û roman di gelek xalan de ji hev cuda bin jî, di wê xalê de digihin hev ku herdu janrên edebiyatê ne, angû ser bi yek kokê ne û mala herduyan jî wêje û edebiyat e. Pêwendiya navbera roman û helbestê pêwendiyê heta hetayî û neguhêr e. Roman bêyî helbest debar nake. Berê di civat û rûniştinan de helbest dihatin xwendin. Gelek caran çîrok û serpêhatî jî bi helbestan dihatin hûnandin. Dûre ev çîrok û serpêhatî dibûn haveyna hikayet, roman û destanan.

Yanî helbest timî di nav civakê de hazir û amade bû, bi taybetî di dîroka edebiyata Kurdî de, dîroka helbestê pir li pêşya dîroka romanê ye. Destanên mezin wek Mem û Zîn û çîrokên qehremaniyê jî bi helbestê hatine gotin. Ji helbestê hikayet, çîrok û destanan çarçove girtine û helbest estetîk û bedewiyeke zêdetir dide wan. Angû ew çîrok, hikayet û romanên ku îro bi şeweya pexşanê têne vegotin, berhema wan destan û çîrokan in ku ji helbestê çavkanî girtine.


Lewra em dikarin bêjin: Vebêjerê çîrok û romanê, bi awayekî ji awayan şîrovekarê helbestê ye û di heman demê de ji hinavê helbestê çîrok û romanê berhem tîne.

Di nava bûyerên romanê de, hertim derbirîna helbestvanî amade ye û zimanê helbestvanî mijara sereke ye. Di nebûna vî zimanê helbestvanî de jî, hunera vegotinê nîvco û nivîşkan dimîne. Çimkî roman dikare bi riya van derbirînan helbestvanî xwe ji zimanê devokî û rojane xilas û cuda bike.

Rexnegirê Fransî yê navdar Jean-Yves Tadié (1936 -) di kitêbekê bi navnîşana (Çîroka Şîrî) de dibêje: “Her romanek bi indaza qesîdeyekê ye. Her qesîdeyek jî di astekê di astan de çîrok e.”

Şîr zimanekî têrwate û himbiz ê derbirînê dide romanê. Wênaya hunerî ku wênegirêkî fotografi bi kameraya xwe digire, romannivîs wê diguhere bo wêneyê dahêner û bi peyv, wêneyê cuda ji realîteyê jê çêdike û tîn û germiyê dide maneyan.

Eger çîrok an destan an romanek bi şîrê hatibe nivîsandin û ji riwangeyê geştî babetan nîşan bide, mumkin e ji girîngiya şîriyeta helbestê kêmtir bike. Çimkî timî hilçûnên dîroki û îdeoloji li ser teksta vegotinê ser-



est in ku ev jî girîngiya şîrê kêmtir bikin. Angû gava romanek bi şîrê tê nivîsandin, şîr dikeve jê kartêkirina bûyeran û helbestvaniya xwe ji dest dide.

Xwîner dikare wê hişyariya şîrî têbînî bike ku di naveroka piraniya romanê de tê dîtin û timî helbestvanî di romanê de reng dide û li ser wê serdest e. Lewra em dikarin bêjin: Şîr minetê li ser romanê dike dema konteksta vegotina bûyeran û pêvajoya vegotinê hevaheng û rewan û zelal dike û zimanekî rewan û xwerû dide romanê.

Jean-Yves Tadié şewaza çîroka şîrî wiha wêf dike: “Mirov hest bi wê yekê nake ku çîrokek mohra şîrî lê hatiye xistin, eger ew kes ne tîkildarî ziman be, kesayetî û dem û cih û binyata çîrokê, ne mercên tenê ne bo zanîna ku çîrokek helbestvanî ye, eger himbizkirin û rîtmîka muzîkê û wêne, timî amade bûn, ew hest li ba xwîner çêdibe ku di dema xwendina çîrokê de wiha bawer bike qesîdeyekê pexşanê dixwîne.

Helbet pêwistiya romanê bi hikayetbêjekî heye ku bûyeran vebêje. Divê hin caran ev hikayetbêj wînda be û rê bide dengêkî din di nav tekstê de vegotinê ragire û hest û helwest û karvedanên xwe nîşan bide. Rengek ji helbestê û awazek ji vî dengî dizê, pêkan e têgiheke wek “ez a lîrîkî” ji bo vî dengî bê bikaranîn ku rê xweş dike ji bo amadebûna lîrîkiyeta şîrê di hûnandina teksteke romanê ya vegotinbend de.

Derbarê ka çiqasî roman û helbest di hundirê tekstan bi xwe de tîkildarî hev in, ev girêdayî tekstan bi xwe ye û pêkan e helbestvaniya teksta romanekê zêde be û di teksteke din

de helbestvanî kêmtir be. Ev li ser şiyana romannivîs û mijara romanê jî dimîne. Angû heta çiqasî mijara romanê rê dide helbest serdest be. Pêkan e nivîskar bi şiyana be, lê wek mînak babeta romaneke polîsî, rê nade zimanê helbestvanî serdest be. Yan nivîsandina romaneke sozdarî û dilînî bi zimanekî hişk û ziwa nayê nivîsandin û eger wiha be girîngiya romanê kêmtir dike.

Helbet ev li hev alan û bi hev ve bûna şîr û romanê, xalên cuda yên van herdu janrên wêjeyî yên girîng kêmtir nake û cudahiya navbera van herdu janran her wekî xwe dimîne. Şîr derbirîneke mirovî ye ku girêdayî hişyarî û hest û karvedana takekesan e. Lê çarçoveya romanê berfirehtir e û jiyanê bi hemû aliyên wê yên cuda ve li xwe digire, bi riya nerîna xweyî û takekesî hişyariya kolêktîf û nerîna giştî derdibire û nîşan dide.

Di aliyê çêj û xweşiya xwendinê de jî, cudahiyeke mezin di navbera roman û helbestê de heye. Çimkî hîm û bingeha romanê bûyer e û rewşa mirovî ya civakan derdibire. Lê şîr hesta takekesî û nava şair û karvedana rewşê deryeyî di nava şair bi xwe de derdibire.

Lewma pêwîst e romannivîs kesekî hişyar û xwedî marîfet be, lê ne merc e ev sîfet di şair de jî hebin, çimkî pêwîstiya romannivîs bi zanyarî û xwendin û şopandinê heye. Lê di gelek rewşan de şair nava xwe dinivîse û ne merc e pêwîstiya wî bi marîfeteke kûr û berfireh û zanyariyên zêde hebe. Çimkî şîr ji nava mirov dizê, lê roman encama temaşekirin û mîzandina li derve ye. Tevî vî jî eger şair xwediyê marîfeteke kûr be, asta derbirîn û wateyên wî yên şîrî kûrtir dibin û dibin rengdana asta marîfî û

Xwîner dikare wê hişyariya şîrî têbînî bike ku di naveroka piraniya romanê de tê dîtin û timî helbestvanî di romanê de reng dide û li ser wê serdest e.

rewşenbîrî ya şair.

Ne merc e şair bikare romanê bini-vîse, lê divê şarezayîya romannivîs di zimanê şîrî de hebe da di proseya vegotinê de tewzîf bike û romana wî/wê ji zimanê hişk ê babetên zanistî û zimanê sade yê axaftina xelkê cuda be. Roman bi şîrê nayê nivîsandin, lê bi amraz û derbirîna şîrî tê nivîsandin. Çimkî ev hevahengiyê di navbera peyv û hevokan de çêdike, da bala xwîneran bikişîne.

Romannivîsê Spanyayî Ernesto Sabato (1911-2011) digot: “Pexşan roj e, lê şîr şev e. Ti romaneke mezin nîne ku bi şîrê nehatibe hûnandin.”

Lewra normal e şair, romanê nenivîse û pê jî nizanibe, lê nabe şarezayîya romannivîs di zimanê şîrî de nebe. Fîlosofê Alman Martin Heidegger (1889-1976) dibêje: “Şîr bingeha huneran e.” Angû her kesek di her warekî hunerî û wêjeyî û marîfî de kar bike, girîng e tîkiliya wî bi şîrê re hebe.

Senger Zirarî

Zimanê Kurdî

3- Seyda Sadiq Behadîn Amîdî di “Rêzimana Kurdî” de, cînav bi “8” beşan parve kirine :

- *Cînavên kesî
- *Cînavên heyî
- *Cînavên nîşankirinê
- *Cînavên bêhêz
- *Cînavên xweyî
- *Cînavên pêgeh
- *Cînavên pirsîyarî
- *Cînavên nadiyar

4- Dr. Kamîran Bedirxan di “Rêzimana Zimanê Kurdî” de, cînav kirine (10) beş :

- *Cînavên kesîn
- *Cînavên destedaniyê
- *Cînavên pêşker
- *Cînavên girêkî
- *Cînavên pirsîyarî
- *Cînavên nebinavkirî
- *Cînavên bîrdar
- *Cînavên hevedudîtiyê
- *Cînavên nebinavkiriye hevedudaniyê
- *Cînavên kurt

5- Dr. Qenatê Kurdo di “Rzimanî Kurdî” de, cînav li ser “10” beşan parve kirine :

- *Cînavên kesî
- *Cînavên likaw (pêvekirî)
- *Cînavên nîşane
- *Cînavên xweyî
- *Cînavên yektirî (lêkdayî)
- *Cînavên pirsîyar
 - Cînavên heyî
 - Cînavên diyar
 - Cînavên nediyar î çendî
 - Cînavên na (neyînî)

6- Dr. Qenatê Kurdo di “Zimanê Kurdî” de, cînavan bi (8) beşan destnîşan dike :

- Cînavên kesî
- Cînavên nîşane
- Cînavên likaw
- Cînavên pirsîyar
- Cînavên heyî
- Cînavên nediyar
- Cînavên diyar
- Cînavên çendî

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

Em lay kelek ew lay kelek, naw-
erastekey burcî belek.

Em lay dîwar ew lay dîwar, naw-
erastekey segêkî har.

- Darebenê le qed kenê, şêx û
mela dest edenê. (* lût/difin)

- Gloley baz, day le hewraz. (*
Çaw/çav)

- Serî be xot, binî be daykit. (*
Memik)

- Ser banêk e bin banêk e, 4 merr
û şîwanêk e.

(* Nav û pişt dest û pence/til)

- Kerî mirdî, barî zîndî. (*M û
lanik)

- Le serewe yek, le binewe du, be
qinkî baw bapîrta çû.
(* Derpê)

- Reşî reşendû, deçête kunêkî be
mû, dête derê aw le dû.

(* Kîlçûk û çaw/kîlçiv û çav)

Têdîtin: Amadekar destkariya
devoka meteloka nekiriye

Xwendevanên hêja!
Hûn dikarin bersiva
tiştonekan bi riya E-Maila
Agiri2003@gmail.com ji
me re bişînin



Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (329)

Rasan, xebata çiya û bajar di çend wêneyan de



SAMAN
HASSANPOUR
KURDISTAN ARMY PESHMERGE
LIFE IS TO STRUGGLE

